
Kurdisch

Gewaltprävention
MiMi Mit Migranten für Migranten

# Parastina ji Tund û tûjiyê bo jinên li Elmaniya

Çapa li ser hatî karkirin



## Rehbera bo jinên derbeder, penaber û cîwanan

Bi alîkariya:

Die Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

## Impressum

Gewaltschutz für Frauen in Deutschland –
Ratgeber für geflüchtete Frauen, Migrantinnen und Jugendliche

Herausgeber:
Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.
Königstraße 6, 30175 Hannover

Konzeption, Inhalt, Erstellung:
Duale Hochschule Baden-Württemberg Villingen-Schwenningen (DHBW)
– Institut für Transkulturelle Gesundheitsforschung

Ethno-Medizinisches Zentrum e.V. (EMZ e.V.)
– MiMi Integrationslabor Berlin (MiMi Lab)

Förderung: Beauftragte der Bundesregierung für Migration, Flüchtlinge und Integration

Projektleitung: Ramazan Salman (EMZ e.V.), Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan (DHBW)

Redaktion: Jasmin Bergmann, Dagmar Freudenberg, Sarah Hoffmann, Olga Kedenburg, Ahmet Kimil, Prof. Dr. Dr. Jan Ilhan Kizilhan, Claudia Klett, Gabriele Martens, Ass. iur. Isabell Plich, Anne Rosenberg, Andreas Sauter, Ramazan Salman, Prof. Dr. Karin E. Sauer, Prof. Dr. Anja Teubert, Susanne Winkelmann, Lutz Winkelmann RA

Layout und Satz: eindruck.net

Übersetzung: Dolmetscherdienst – Ethno-Medizinisches Zentrum e.V.

Bildquellen: Umschlagbild und Bild auf Seite 16 © Tom Platzer „Styling time4africa“
Ministerin Widmann-Mauz: Bundesregierung/Kugler · Seite 2: © iStock, imagesbybarbara
Seite 5, 22, 25, 29: © Fotolia · Seite 11: © iStock, m-imagephotography

Alle Rechte vorbehalten. Das Werk ist urheberrechtlich geschützt. Jede Verwendung in anderen als den gesetzlich zugelassenen Fällen bedarf deshalb der vorherigen schriftlichen Genehmigung durch den Herausgeber.

Diese Publikation können Sie jederzeit über die Webseiten „www.mimi-gegen-gewalt.de“ oder „www.mimi-bestellportal.de“ in folgenden Sprachen anfordern: Deutsch, Albanisch, Arabisch, Bulgarisch, Dari, Englisch, Farsi, Französisch, Kurdisch, Paschto, Polnisch, Rumänisch, Russisch, Serbisch/Kroatisch/Bosnisch, Spanisch, Italienisch, Türkisch und Vietnamesisch

3. Auflage · Stand: November 2018

# Peyva bixêrhatinê

Xwendevanên xweştivî,



Ji sala 2016an ve, li seranserî Elmaniya projektê „MiMi-pêşîlêgirtina li tund û tûjiyê bi penaberan re ji bo penaberan" heye. Em dixwazin di rêya vî projektî re keç û jinan bi hêz bikin û alîkar bin, daku ew ên tûşî tund û tûjiya cinsî bûne, an gef li wan bûye, li ser mafê xwe û delîveyên parastinê serwext bin.

Awirek li hijmaran pêdiviyê diyar dike: di sê salên dawiyê de rêjeya 1,36 miliyon daxwazên penabertiyê pêşkêş bûn, ji wan 463.000 an rêjeya 34 % ji wan jin bûn. Ne her mirovek pêdivî bi alîkariya pêşîlêgirtina li tund û tûjiyê heye. Lê belê gelek ji wan jinan li welatên xwe an jî li ser rêka penabertiyê tund û tûjî dîtine an serpêhatî di vî warî de jiyane.
Ji bo gelekan zor e li ser tund û tûjiya cinsî baxivin. Jin jî gelek caran û yekrast li nêzîkî cihê-wergirtinê dimîne û xwe dûr nake ne mîna zilaman e. Ji ber wê jî ev projekt pala xwe dide- mediatorên xwedan serpêhatî mîna yên navenda nojdariya-regezan (EMZ): Navbir ji serpêhatiyên xwe dizanin, ka çawa xwe bigihînin jîngeheke nû, dikarin derdoreke hemî xerîb bin. Nexasime dema serpêhatiyên diltezîne bi ser ve zêde bibin.

Ev navbir yekrast berê xwe didin cihê mana penaberan- li cihê mana wan (kamp) û li ba malbatê. Li wir rê û pêzanînan nîşanî jin û keçên sinêl didin, ji bo mirov,- parastina zarokan- û mafê jinan û destnîşan dikin, ka çawa bi karibin xwe ji êrîşan biparêzin. Di vê rewşê de, mirov li ser kultûr-, ziman- û hesteweriya zayendeyan kar dike.
Ez kefxweş dibim, ku ev projekt ji sala 2018an ve, giraniya xwe dide ser pêşkêşiyên pêşîlêgirtinê ji bo mêran û kar li ser tê kirinê , ku wan wek midiyatoran (navbiran) fêr bike. Ji bo rêzgirtinê ew karê bê tund û tûjî bi hev re nabe, eger yeksanî di navbera jin û mêran de peyda nebe.

Xwendevanên hêja û xweştivî, ez bi hêvî me, ku ev berhevok karibe li kêleka karê we yê giring ji bo alîkarina pernaberan alîkarî bûbe.

*Annette Widmann-Mauz*
*wezîra dewletê li ba rawêjkara Elmaniya û erkpêdera hukumeta federal ji bo kar û bar penaber, koçber û pêk ve jiyanê*



# Naverok


## 1. Penaberî, derbederî û Tund û tûjî ..................................... 4

Tund û tûjî mîna sedemeke derbederiyê | Tund û tûjî di dema derbederiyê de
Tund û tûjî li kampên penaberan | Tund û tûjî di pey derbederiyê re

## 2. Şêweyên tund û tûjiyê ..................................... 8

Tund û tûjiya rasterast | Tund û tûjiya binenetî | Tund û tûjiya sazumankirî

## 3. Tund û tûjiya li dijî jin û zarokan ..................................... 12

Kî cinayatkar e? | Sedemên tund û tûjiya li dijî jin û zarokan
Nimûneyên tund û tûjiya jin û zarokan | Encamên tund û tûjiya li dijî jin û zarokan

## 4. Rêkên ji tund û tujiyê diçin ..................................... 26

Mafê parastinê bo qurbaniyên tund û tûjiyê li Elmaniya | Pêkve azad ji tund û tûjiyê

## Ferhenga têgehan ..................................... 32

## Adrêsên têkiliyê yên bijarte ..................................... 36

# 1. Penaberî, derbederî û Tund û tûjî

## TUND Û TÛJÎ MÎNA SEDEMEKE DERBEDERIYÊ

Sedem**ek** ji yên derbederîyê bo jinan tund û tûjî ye. Ev jî girêdayî wê hindê ye, ko li seranserî dunyayê jin hîn mafê yeksanî di navbera wê û mêr de nîne: Raste ta 2014an, 143 ê welatan mafê yeksanî di zagona xwe ya bingehîn de himbêz kiriye. lê ew berma û bîr û baweriyên kultûrî û olî yên digihin vê serdemê seranserî dunyayê diyar dikin, nirxê jinê ji yê mêr kêmtir e.

***Rewşa yasayî:***
Di 1949an de, komîsiyona mafê jinan (CSW) hate damezirandin. Ew pêdivî bû bibe sedema *başkirina rewşa* jinan ya siyasî, aborî û statuya yasay civakî. Di 1979an de lihevhatina ji bo rakirina her şeweyî ji cudakariya jinê wergirt (Convention On The Elimination Of All Forms Of Discrimination Against Women – CEDAW) bi xwe ve. Di 2015an de, ji 189 welatan hate muhurkirin. Elmaniya jî ew imze û muhurkir.

**Şideta li ser *hîmê cinsan* (wek nimûne tund û tûjiya cinsî û ya navmalê)** curm in. **Mirov dikar li dadgehê gileh bike.**

Hîn ji hêla desthilatdariya mêr li ser jinê ve tund û tûjiya malbatî û cinsî li malê bikar tê. Nimune bo wê hindê:

– Sinnetkirina regezên mêyan, di gel ko bi fermî qedexe ye lê hîn jî berdewam cihbicih dibe.

– Newekheviya têkiliyên desthilatdariyê di navbera jin û mêran de, li gor *têkiliyên girêdayî**, dihêle jin mîna „Tiştek“ û serderiyên cinsî weke „pere“ diyar bibe. Encama wê yekê zor caran zewaca bi tadeyî ye, lê carnan jî Tade- û qehpîtiya ji belengazî û barzirganiya mirovan ye.

– *Serederiya xerab* ji jin û zarokan di rêya mirovên ko di xizmeta dewletê de (Polîs, an jî karmendên welat î) li welatên jê hatî, li gor girtin û tehqîqkirinê.

– Tund û tîjiya cinsî ji ber sedemên siyasî, hin komên neteweyan yên destnîşankirî di rêya tecewazkirina bi komel wan bindest bikin an jî ji kokê bêne hilandinê.
Li vir, êdî mirov ji *„pakijîya etnîkî“* diaxive, tundûtûjiya cinsî li vir weke çekekî cengê ji bo rebenîkirin an bişaftina hin civakan tête bikar anîn. Jinan dibin kampên tecawizkirinê (rape camps) û wek zindiyan têne girtin.

– Piştguhxistin an jî rewşeke tund de kuştina zarokan, yê di pey tecawizkirina di cengê de xwedê ew dayî. Zarok, ên sax dimînin, di gelek civakan de dayîka wan, çu tenahî û çu parastin di rêya yasayî re jê re dernakeve. Her wisa jî zarok ên di cengê de dê û bavên xwe winda kirî (Sêwiyên cengê), pêdivî ye carnan bo leşkeriyê kar bikin an jî wek leşkerên zarok şer bikin.

** Di ferhenga têgehan de hinek peyv bi xwehrî hatine nîşandan*

Li tenişta van sedeman mîn tundûtûjiya li dijî jin û zarokan hin sedem ên din yên derbederiyê hene, bo nimûne ceng û *derbederkirin*. Derbederî bi xwe jî dikare ji bo jin û zarokan metirsîdar be. Li ser rêya derbederiyê gelek caran tund û tûjî bikar têt.

## TUND Û TÛJÎ DI RÊKA DERBEDERIYÊ DE

Li dema derbederiyê, jin di metirsiyê taybetî de ne, tûşî tund û tûjiyê bibin. Keleş, diz, hêzên asayîşan, qaçaxçî an jî hinek *derbederên* din dikarin bibin nimûne bo hekandina cinsî an jî tecawizkirin. Berpirsê parastina sinor bo nimûne jin û zarokan jin û zarok û yê hatî tecavizkirin, demeke dirêj digirin. Keleş jinan wê êxsîr digirin û guvaşê li wan dikin, bo seksê. Êdî dikarin rêya xwe de herin, ew derbasî sînoran bibin. Qaçaxçî alîkariya jin û zarokan dikin li ser sinoran. Ji bo wê jî daxwaza seks an jî zêr/tiştên buha dikin.



*Metirsiyeke* zor, li rêya derbederiyê tûşî seksê an jî tund û tûjiyê dibin, dema weha be:

– Jinên bi tena xwe bi an jî bê zarok
– Jinên ducan an jî yên demejînin
– keçikên cîwan û zarokên bitena xwe
– Zarokên zû zewicî- hinek bi yên nû xwedêdayî
– yên seqet û mirovên bi temen
– kesên, yên nikarin *danûstendinê* bikin

Derbeder jiyana xwe ya li ser rêyan demeke dirêj di kampan de bi ser ve dibin. Ev zor caran cihê vehewandina derbederiyê ye di dema seferê de. Li wir metirsî mezin e, ko tûşî tund û tûjiyê bibin. Yên derbeder di wisa kampan de girêdayî rêkxistinan in. Ew pêdivî ye veheweyên xwe xudan bikin û jiyana wan tamîn bikin. Ji ber wê jî, ew çavdêriya li ser xwe winda dikin. Ev dikare bo mêrên derbeder bibe aloziyek, ko ew metirsiyê li ser cihê xwe yê civakî bibîne. Ji ber wê gelek caran bi tundî serederiyê dike.

> **!** **Dibe ko sedem û sersebeb bo danûstendinên tundrewî hebin. Ev nikare bibe hincetek ko tund û tûjî ji hêla mêran ve li jin an jî zarokan bibe.**

## TUND Û TÛJÎ DI CIHÊ VEHEWIYANA DERBEDERAN

Li cihê vehewiyan derbederan li Elmaniya agahiyên zêdebûna rêjeya karên tund û tûjiyê beramber jinan digihin. Rêjeya derbederan ji mêran bêhtir ji do ser sêyan e, bêhtirên wan di bin 30 salî re ne. Kêmbûn di *cihên parastina* jinan an jî *saziyên jinan* hene.

Mafê rûniştinê- û mafê penabertiyê dihêle serederiya di gel tund û tûjiyê li dijî jinên derbeder zor bibe. Lê karmendên biyaniyan dikarin jinan biparêzin. Bo nimûne ew dikarin, di rewşa tund û tûjiyê de, biryarên awarte bo *erkê cihê rûniştinê* û xanî û cihê vehewandinê li bajar an jî herêmên din pêşkêş bike.

Bo parastina yasayî li cihê vehewandinê ev derfet bo nimûne hene:

– qewirandina tewanbarên tund û tûjiyê, bo demeke kurt ji cihê vehewandinê bi rêya polîsan
– Tevdîrên demdirêj li gorana *qanûna parastina ji tund û tûjiyê (GSG)*
– Mal lêqedexekirin

Ev tevdîr zor caran alîkariya wan kurt e. Tund û tûjî li dijî jin û zarokan di cihê vehewandinê de jî di rêka rûniştiyên an jî yên bi wan re seferê dikin dibe. Di navbera hevpişkan de, têkiliyên pêvegirêdan ava dibin. Lê *xwestekarê penaberiyê û yê rêpêdayî* di cihê vehewandinê de bitenê û xwevekişiyayî dijî. Ew piştgirî an alîkariyên hiqûkî, li cihê mana rûniştinê bi zehmetî werdigirin. Gelek hene bawerî nîne, ko li alîkariya yasayî bo xwe bigerin. Hinek

ji xwe ditirsin ko mafê mana rûniştinê li Elmaniya winda bikin. Dema jin mafê penaberiyê daxwaz bikin, pêdiviye ew derbederiya xwe rûspî bikin gelek şerm dikin, tundrewiya cinsî binav bikin. Bi vî awayî, serîlêdana wan beşek bi zewaca wê ve girêdayî.

**Berbi derfetên hiqûkî kartêkirinê li pêvajoya penaberiyê nake.**

## TUND Û TÛJÎ DI PEY DERBEDERIYÊ RE

Ne tenê li cihên vehewandinê jin û zarok rû bi rûyê tund û tûjiyê dibin. Ew jî li nav civakê li *welatê wergirtinê* diqewmê.

Zaniyar Susanne Johanson di pişkinîna ya xwe ya 2015an de destnîşankir, kobêhtir ji sê li ser çaran ji jinên penaber li Elmaniya serpêhatiyên wan di gel *tund û tûjiya derûnî* heye. Nîvê wan tûnd û tûjiya laş dîtine û ribek ji wan ya cinsî. Lêgerînek ya Amnesty International jî diyar dike, di gel serpêhatiya tund û tûjiyê di rêya koçberiyê de, tirsa jê li Elmaniya jî heye.

Yên cinayetkar hevser, kesên biyanî bûn, di xaniyekî de an jî di malekê de. Şêweyên cur bi cur yên tund û tûjiyê li deverên vekirî pêhatine, mîna cihê vehewiyan û xaniyan.

Hinek mirov ditirsin, ku bi tena xwe ji kampa penaberan derkevin. Sedem ên wê jî tirs ji:

- Pîskirin û sixêf/ xeberên ne di rê de (cinêw) ji hêla kesên yê cih li ser kolanan
- Êrîşa fîzîkî û tund û tûjiya nijadperestî
- Cudahîkirin an serederiya newekhev li dibistanan, li peymanên fêrbûnê an li cihê karî

Di navbera salên 2015 – 2017an bêhtir ji 2200 êrîşî, li Elmaniya li ser kampên penaberan rûdane (bo nimûne, agirpêxistin/şewitandin).

Digel şîdeta li ser hîmên cisan tund û tûjiya tund û tûjiya nijadperestî jî di jiyana penaberan de gelekî heye. Ev bi taybetî ji bo cîwanan dibe.

# 2. Şêweyên tund û tûjiyê

Tund û tûjî di gelek qûnaxan, bi gelek şêweyan xwe derdibire. Bitaybet mirov sê şêweyên tun û tûjiyê ji hev cuda dike.

– Tund û tûjiya rasterast

– Tund û tûjiya bineretî

– Tund û tûjiya sazumankirî

**!** **Her jin û zarokek eynî mafê wan heye mina mêran. Mafê wan heye bo alîkarî û parastinê ji hemberî guvaşan jî.**

## TUND Û TÛJIYA RASTERAST

Tund û tûjiya rasterast ji kesekî derdikeve û li dijî kesan an tiştan çedibe.

**Nimûne zarok:**
Bav, li gor gotina wî hez ji keça xwe ya duzdeh salî ya mezin bêhtir ji her tiştî dike. Ew jê re rave dike, ji ber wê jî ew bi wê şa dibe. Ew dixwaze destê xwe bide hemî laşê wê û dibêjiyê: „di nav malbata me de em wisa ne, ji ber vê yekê divê tu bêdeng bî û ji kesî re li ser nepeyivî.“ Bav keça xwe dixe bin guvaşê, dema jê re rave dike: „Tişta em dikin, gelekî normal e, hemî wisa dikin. Diya te nema dixwaze bi min re raze, ji ber wê divêt tu bikî.“

Ew gefê lê dixwe, ew wê bikeve zindanê eger ew bi hineke din re li ser biaxive. Ev destdirêjiya cinsî ye.

Sinorê zarok dikar hîn gelekî beriya wê demê jî derbas kiribe, bo nimûne, di rewşên rojane de: Bavpîr, her dem roja yekşembê tête seredanê û bo silavê dixwaze maçekê bide neviyên xwe. Lê keç naxwaze qet maçê bidiyê, lê ew rêzê Ji daxwaziya wê re nagire.

Zarok dikare baştir were parastin, li wê dema fêr bibe

– Bibêje „na“ û

– Xizmên wê fêr bibin, sinoran nas bikin û rêzê lê bigirin.

Şîdeta cinsî di nav malbatê de babeteke aloz e. Bi derketina hin nîşanan pêdivî ye têkilî bi *saziyên şêwirmendiyê yên pispor* re bête danîn. Yê şêwirmend li wir *erkê nemukurhatinê* heye, nabe ew ji kesên din re veguhêzin. ew dikarin pêşniyaran bikin, ka mirov dikare çi bike û çawa xwe biparêze.

**Bo nimûne jineke gihayî:**
Mêrek jina xwe bi salan wisa tê digehîne, ku pê re cins bike, her dema ew bixwaze. Wate ew wê mecbûr dike, li dijî dilbijiya wê jî be, ku pê re raze. Ew mecbûr e û ji hêla cinsî ve lê xweş bîne. Ew dibe sedema birîndarkirinên giyanî, belê birîndarkirinên laş jî. Gelek caran jin behwer dikin, ku lêdan li wan bikeve, dibînin ev mafê mêran e. Ev gelekî yê hevjînan bi hêztir dike, dema mêr tund û tûjiyê dike, dibîne ew bi xwe gunehkar e. „Eger tu li ber xwe nedî û ya were gotin bikî baştir e ji te re“, mêr dibêje. Ew behwer dike, mafê wî heye bi jina xwe here nav cihan, çendî ew nexwaze jî. Lê ev nerast e û li Elmaniya ev kar tê sezadan.

Şêweyekî wisa tund û tûjiyeke ko yekser û zelal diyar bibe. Êdî jin bitena xwe dimîne, ji ber malbat û xizim:

– zor caran bawer nakin, ko bibe qurbana van şêwe tund û tujiyê ji mêr pêk bihên;
– Baweriya wan, ko ew mafê mêr e. Ji xwe divêt tişta mêr ji hêla cinsî ve bixwaze, jin qebûl bike;
– şêwirê nakin, gelek ji xwe nagirin li ser deng bikin. Di dawî de, çu derfetên din nînin.

## TUND Û TÛJIYA BINERETÎ

Tund û tûjiya avahîker di rêka têkiliyên desthilatdariyên newekhev de binecih dibe. Desthilatdarî li ser mirovên din hebe, tê wateya, tenê di asta yekem de ku bikaribe kartêkirinê li ser rewiştê mirovên din bike, ku gelek an jî hindik, li gor berjewendiyên wî bigunce. Ev ji awira yekem ve ne şaş e û di her têkiliyekê de, di nav mirovan de çê dibe.
Bi tabetî di nav dê û bav û zarokan de, lê di navbera lêkdaneke din jî de. Ya giring ew e, ku mirovên din mafê wan bi çarenûsa wan ne sinordar be.

**Nimûne:**
Dema mêr di malbatê kar bike û peran tînin, desthilatdariya wan li ser rewşa darayî dibe.
Destdanîna ser pera gelek caran wateyeke mezin heye. Pêvegirêdan ji wilo çêdibe. Dema mirov pera û tiştên din winda dike, hest bi netenahî û tehdîdê dike. Ew mirovê desthilat heye, dikare ji ber wê sedemê tenahiyê bide û an jî dubare werbigire. Ev dikare endamên xizanê an jî hevala winda bike. Ji ber wê desthilat (Tund û tûjiya bineretî) kartêkirinek mezin li jin û zarokan di wisa tund û tûjiyên bineretî yên destnîşankirî hene.

Piştgiriya tund û tûjiya bineretî ji ber newkheviya hêzê di desthilatê de tete kirinê. Ew endamên din yên civakê mafê wan gelek caran tune ye an jî ew bi xwe nikarin parastina xwe bikin. Ew nikarin biryarê werbigirin, ka çi bo wan baş e û çi giring (bo nimûne, dixwazin li kû bijîn).

Desthilatdarî netim negatîf e. Kesek ko desthilatdariya wî li ser mirovekî din hebe, pêdiviye wateya wê baş bizanibe û mesele li ba wî zelal be û bi berpirsiyarî di gel serederiyê bik. Pêdiviye dê û bav desthilatdariyê bikar bînin, bo alîkarî û parastina zarokên xwe bikin. Di çarçova xizmet û alîkariya wan de. Ev jî dibe, bê ko pereyan bo pêdiviyên jiyanê pêdivî bin, bê ko desthilatdarî bi şaşî bête bikaranîn.

## TUND Û TÛJIYA SAZUMANIYANE

Tund û tûjiya sazumanî formek e ji tundrewiyê, ew di rêka bineretiyê bêne çêkirin an jî yê heyî têkiliyên tund û tûjiyê bi hêz dike. Ev rê li ber mirovên din digire, kar bikin, ko ji bo wê tenê giring be (bo nimûne, li dema karî, di dibistanan de an jî kampan, yê di demên destnîşankirî de dibin an mirov bi yê çavlênêrê xwe ve girêdayî ye).

Bi giştî pêdiviye tund û tûjiya sazumankar bo fermanan alîkar be. Hevwelatiyên welatekî di rêya rêma û hiqûkî de tenahiya xwe ya bi wekhevî serederî ji bo hemiyan dibe dijîn. Armanc ji wê ye, ko bi aştî û rêzlihevgirtin pêk ve bijîn. Nabe ev rewş ji hêla kesekî ve, çi polîs, çi alîkarvan an jî ji malbatê be bi şaşî bête bikaranîn.

Zorbey caran şêweyên cuda ji tund û tûjiyê têkiliyên wan bi hev re hene û li tenişta hev dimînin.

Zor caran gelek reng ji tund û tûjiyê di eynî dem de hene. Tund û tûjî di çandân cuda cuda de tên. Belê di navbera çandan cuda de jî tund û tûjî heye. Bo nimûne di bineretiya çanda civakên ko ji wan re tê gotin civakên patiryarkî de tête piştgirîkirin. Li wan civaka desthilatî bêhtir ya mêran e û di eynî dem de mafê jinan kêmtir e. Ew karin kêm di jiyanê de, di nav civakê de cih bigirin bo nimûne wergirtina xwendinê, bo xwe karkirin.

Lê di nava civakê de û li tevaya cîhanê jî (newekheviya belavkirina jiyaneke xweş neyekasn e, belengazî, têkiliyên di navbera welatên belengaz û dewlemendan de) dikare rê li ber tund û tûjiyê veke.



# 3. Tund û tûjiya li dijî jin û zarokan

Saziya Cîhanî ya Tendurustiyê SCT tun û tûjiya li dijî jinê weke metirsiyeke herî mezin li ser tendurustiya jinê li seranserî cîhanê dibîne. Yekîtiya netewayn dibêje, tund û tûjiya li dijî jinan ew serederî ye, ya ko şop û şûnên gewdane, cinsiyane an jî derûnêşan e dihêle û tehdîd e bo wan. Tişta pê ve girêdayî jî *zorlêkirin* û jêstandina *azadiyê* di karê fermî de an jî di jiyana pirîvat de. Li gor vê tund û tûjiya li dijî jinê di bin van şêweyên li jêr têne naskirin:

**Tund û tûjiya gewdane, cinsî û derûnî di hundurê malbatê de:**

- Tund û tûjî di nav û derveyî jinûmêrîtiyê (bo nimûne lêdan, bikaranîna cinsî xerab, tecawizî, *rebenîkirin,* tehdîdkirin)
- Tada cinsî li zarokan di malê de
- Tund û tûjiî, ya bi qelen ve girêdayî
- Her iyadeke xurust, ya ji bo jinan ziyandar be (bo nimûne sinnetkirin)
- Tund û tûjiya bo *kedxwariyê* pilankirî be

**Tund û tûjiya gewdane, cinsî û derûnî di nav civakê de:**

- Jirêbirin, acizîkirina cisî, serederiya cinsî xerab û tecawizî li cihê kar, saziyên zanînwergirtinê û li her deverekê
- *Bazirganiya bi jinan* û *qehpîtiya bi zore*

**Tund û tûjiya gewdane, cinsî û derûnî ya ji hêla dewletê ve dibe an jî destûr têtê danê**

**Rewşa yasayî:**
**Bikaranîna tund û tûjiyê – gewdane û derûnî („birîndarkirina gewde“) – li elmaniya sizadar e!**

## KÎ KIRYARDAR IN?

Rêjaya ji sedî 90 ji kirdaran di wan buyerên diqewimin de dibin, mêr in û ji derdorên nêzîk ji yê bi vê babetê ve têkildar tên. Ew ji hemî çîn û taxên civatê tên. Ew kes dikarin Mêr, Bav, babpîr, mamoste, hevalê malbatê, rahêner, mam, bira, qeşa, terapîvan û bêhtir ji wilo bin. Bikaranîna xerab ya desthilatê an jî bikaranîna cinsî ya xerab rewşa mirovên têkeldar, bi taybetî jin an jî zarok, bi şêweyekî taybet tête çewisandin.

Li gor STC (Saziya Tendurustiya Cîhanî, WHO) gelek caran jin di hin civakên destnîşankirî de ji serederiya xerab ji hêla yê *pê re cins* dike dibîne. Di van civakan de yeksanayî di navbera jin û mêran peyda nabe. Rol ên mêr û jinê bi şêweyekî bihêz hatine çesipandin û nirxên wan yên çandî mafê mêran yê cisî daniye. Hestên jinan

li ber çavan nayên girtin. ev karên weha kêm dihêne sizdanê an jî zor caran bi başî têne li qelemdanê.

Ew yên têkildar, zor caran li şiroveyan digerin. Eve dikarin gunehê yê tewanbar sivik bikin. Ev diçe wê hindê, ko serederiya di gel tund û tûjiyê bête rewakirin û yê tewanbar hanbide va karan dubare bike. Ew xwe li gor nêrîna xwe bi rast dibîne, ko wate: „Encama kiryara min nîne." – „Tiştek bi min nabe!" – „Hemî ji min ditirsin û rêzê li min digirin!"

## SEDEMÊN TUND Û TÛJIYA LI DIJÎ JIN Û ZAROKAN

Ev bineretiya neyeksanayî ya di navbera jin û mêr de, alîkariyê bo tund û tûjiyê li dijî jinê dike. Di wê rê re ev bihêz dibin

– ***Bineretiyên petiryarkî***
Ev binertiyên han yek rengî ji mêrên destnîşankirî- û jinê nas dike. Wateya mêraniya zorê caran desthilat, hêz û *serdestî* û *xweşbînîya* mêbûnê, *pasîvmayîn* û bindestî;

– **Ew daxwazî nêrînên bi hêz yên mêran in û eynî dem de têgehiştina serdestiyê.**
Di gel re gelek caran serederiya xerab pêk tê, ji ber mêr bawer dike, ew xudan maf e di wir de. Ew dikare her tiştî bi xanima xwe bike ta bi gewdê wê jî û li ser hemî, tişta jin dike, bi kê re biaxife, çi cilan li ber xwe bike, biçe kû.

– **Pirbûna serbixwebûna jinan (karên rojane û pîşe):**
Hinek mêr hene vê yekê wek gefê hest dikin, dema jinên wan di hêla mewdanî û civakî serbixwe ve biçe.

– **Bêgaviya mêr (di rewşa penabertiyê de, nebaş têgehiştina zimanî, bêkarî)**
Ev dikare bibe sedema sarbûnekê, êdî bibe sedema bêhintengiyê li dijî malbata xwe bi xwe. Ji bo mêr dikare bo demeke nêzîk bibe weke valahiyeke hestiyar. Di pey re poşmanî tê. Ta êdî rol dubare destpê bike.

– **Gefa cudabûnê:** Jin, yên dixwazin xwe ji mêrê xwe/hevjînê xwe cuda bibin, metirsiya ku tûşî tund û tûjiyeke bibin zor bilind e. Mêr nikare tehmul bike, ji ber wisa tê digihe, ku jin milkê wî ye.

Hinek mêr behwer dikin, ku bikaranîna desthilatdariyê û kontrolê, serdestbûnê û tund û tûjiya derûnî jî wan dikin mêrên „rastteqîne" baş. Ev her car dibe sedema pirsgirêkan di gel mafê jinê ji bo yeksaniyê di civatê de.

**!** ***Wekhevî* di hiqûka Elmaniya da hatiye sazkirin.**

Eve demeke dirêj e, ko jin û mêr bi ser erkên xwe ve bûne. Hinek dibînin, ko heme tund û tûjî jî normal e. Ev rollên ko eve demeke dirêj e têne bikaranîn pêdiviye bêne guhertin. Ev guherîn dikare demeke dirêj bistîne, lê giring e, dako bikaribe êdî dawî li tund û tûjî êdî were.

## NIMÛNE JI TUND Û TÛJIYA LI DIJÎ JIN Û ZAROKAN

Tund û tûjiya li dijî regezan bêhtir di beşên pirîvat de hene, di navbera hevpişkê jiyanê (tund û tûjiya malbatê) û mîna tund û tûjiya cinsî.

### TUND Û TÛJIYA MALBATÊ

Pênasîneke bi serê xwe, tam bo *tund û tûjiya malbatê* tune ye. Bêhtirîn car mebest ji tund û tûjiyê, ew ya hevpişkê têkildar yê berê li dijî hevpişka xwe an jî hevpişka xwe ya berê bi kar tîne. Ew wisa tund û tûjî ye di navbera yên temen gehiştî di nav malbatê de an jî li nik mêr û jinê. 90 ji sedî ji van cinayetkaran mêr in û jin yên tade li wan tê. Gelek caran jî, di eynî demê de zarok jî dibin qurban.

Mebesta tund û tûjiya nav malê kontrolkirin û *bikaranîna desthilatdariyê* ye. Taybetmendiyek ev e: Ew berî hertiştî li cihên prîvat diqewime. Jîngeha taybet, taybetmendî, yên tawanbar jî diparêze. zor caran jin û zarok naxwazin yan nikarin li ser tawanan bipeyivin. Ew ji tund û tûjiya mêran/bavan ditirsin. Gelek jî ditirsin, ku malbat ji hêla polîs ve ji hev cuda bibin, eger ew li ser tund û tûjiya malbatê bipeyivin û ji ber wê mukur nayên.Dikevin rewşeke teng de.

Bo nimûne tund û tûjiya nav malê:

- **Tund û tûjiya gewde**
  Nimûne porkişandinê, şeqamlêdanê, boks, niqrîsk, paldana ser, xeniqandin, kelbçekirin û êrîşkirina bi tiştên cuda (çek jî).
- **Tund û tûjiya derûnî**
  Nimûne hevjîna xwe li pêş mirovên din ve bike cihê pêkenînê, rexne li ser tiştên biçûk lê bike, bênirxkirin, nîqên nerast, tirsandin, gefxwarin li dijî zarok ji berdana zarokan ta bigehe gefên kuştinê;
- **Tund û tûjiya cinsî**
  Nimûne statt mîna bi zordarî an mecbûrkirin bo karê cinsî, tecawizî an jî qehpîtiya bi zordarî.
- **Tund û tûjiya civakî**
  Ev diyar dike mîna çavdêriya danûstendinê bi mirovên din re û qedexeya têkiliyan, lê zindankirinê jî. Carcaran yê kirdar yê qurbanî tête dorgirtin û dûrkirin ji malbata û derdora hevalên xwe.
- **Tund û tûjiya aborî**
  Armanca vî şêweyî ji tund û tûjiyê ew e bi mewdanî bête girêdan. Yê cinayetkar kar li wan qedexe bike, an bi zorê ew jibo wî kâr bike. Usa ew tenê dibe berçavkerê peran.

## TUND Û TÛJIYA CINSÎ

Tund û tûjiya cinsî dikare parçeyek ji tund û tûjiya malbatê be, lê ew hîn bi zedetir diçe.

Ew ji wê peyvê destpê dike, dema jinê bênirx dike. Zor caran awrên xerab hene an jî acizkirina bi gotinan. Şêweyê wan ji *binpêkirina sinorên* cinsî, acizîkirinên cinsî ta bigihe destdirêjiya cinsî. Sinorên di navbera her yek ji wan şêweyan de negelek xuyaye û diherikin nav hev.

Ev şêwe ji tund û tûjiyê cins mîna çekekî bikar tê. Tund û tûjiya cinsî desthilatdariya xwe nîşan dide û di eynî dem de qurbanî stûxwar dike. Mirov dikare çend şêweyên cuda ji tund û tûjiya cinsî bibîne. Ev dikarin di nav mezinan de bêne dîtin. Carnan mezin û cîwan tund û tûjiya cinsî li dijî zarokan bikar tînin an jî zarok li dijî zarokin in din bikar tînin. Qurbanî dibin

- **Tecawizî:** Tawankar bi gelek rengên cuda bi kîrê xwe derbasî qurbaniyan dike, bi tiştan, carnan hinek kes an jî teba dikin;
- **Cins bi darê zorê kir:** Yê cinayetkar bi darê zorê bi yê qurbanî dike, ko ew bi xwe, vî şêweyî an jî hin şêweyên din ji cins bo xweşiyê bike;
- **Acizkirina cinsî:** Yê cinayetkar bê daxwaza ya têkildar destê xwe davêje sing û qûna wê.

Ew tawanên heyî bi giştî yariya xerab bi desthilatê ye, cinayetkar bi zanebûn dike û ne ji nişka ve. Ew dixwaze xwe kêfxweş bike an jî yê qurbanî riswa bike. Ev tawan sizabar in (tawanên cinayatkar in).

Birîndarkirina sinorên cinsî beramber ne sezadar in (sezayeke yasayî, ku têkildarî bi *pişkên sezayê* re hebe), lê dikare gilih were hildan.

**!**

**Wek qurbanî ji her şêweyekî ji van şêweyên tund û tûjiyê hebe, nabe sedem ko bi xwe mijûliyên xerab bike an jî bi çi şêweyê xwe gunehkar bibîne! Çi gunehê we nîne, ne piçekî jî. Belê çu berpirsiyariya te jî nîne ji ber wî karê tund û tûjiyê, ew yê li te tête kirin. Nepêdiviye tu rewiştê yê cinayetkar têbigehî an jî daxwaza lêbuhurînê bikî: (Nimûne: „Çûna wir şaş bû. Min tiştek şaş gotibû. Dibe kirasê min kurt be“).**

## PINPÊKIRINÊN SINORÊN CINSÎ

Birîndarkirina sinorên cinsî hinek caran ne bi mebest in, ew buyer gelek caran bi sedema nezanebûnê û şaşiyekê an têrênekirineke hestiyariyê ne.

Gelek caran birîndarkirina sinorên cinsî dibin destpêka serederiyên cinsî yê sezabar. **Serpêhatî diyar dikin, ku pirê caran yê qurbanî nikare li ber xwe bide. Ew gelek caran her êrîşekê weke şokekê dibînin û ditirsin. Ji ber wê gelek ji yên têkildar nikarin di vê rewşê de li ber xwe bidin. Di gel wê yekê tu gunehê wan di vir de, tişta bi serê wan hatî tune.**

> **!** **Bibêje an jî bi zelalî nîşan bike: "Raweste. Li vir û bes".**

## DESTDIRÊJIYA CINSÎ

Niyeta destdirêjiya cinsî, mirovek din e (li vê tawanê zayend bo wî mirovê tawanê dike biwate ye) bo pîskirin û kêmkirinê. Hingivtina qûnê an jî singan dikare nimûneyek bo destdirêjiya cinsî be.

Li vir jî giring: Yê li hemberî xwe bi gotinan an jî bi nîşanekê, ko ew dest ji van karê xwe berde. Ev dikare berbi tund û tûjiyê ve biçe. Lê ev her dem biser nakeve. Mirov



dikare alîkariyê bixwaze, êdî: Hinek cinayetkar bi mebest sinorê xwe derbas dikin!

## BIKARANÎNA XERAB YA CINSÎ

Şêweyekî taybet ji tund û tûjiya cinsî ew e jê re dibêjin bikaranîna xerab ya cinsî. eve serederiyeke cinsî ji mezinan li keçên û sinêl di bin 14 salî re. Çi dibe, ev keç an jî sinêl bi xwe bixwazin, bikin (bi rezaya wan e) an ew nexwazin.

Li vir şêweyên din ji tund û tûjiya cinsî heye. Hindek zarok (lê mezin jî) bi gewde, giyanî, eqlî an jî bi sedema bikêrhatina zimanevanî hêza wan ji ya cinayetkar kêmtir e.

Ew nikarin bizanebûn qebûl bikin. Yê cinayetkar cihê desthilatidariya xwe bikartîne.

Cinayetkar hene, yên bi stratîjiyên cuda cuda (gelek caran di rêya Chatroom yên internêtê) têkiliyê bi zaroka û sinêlan re dideynin, amadekariya serederiya tund û tûjiya cinsî bikin. di gel cara yekem daxwaza xwe nîşan dide, êdî pêwendî tête avakirin. Cinayetkar gelek tiştên cuda êdî li dor yê beramberî xwe dizane û dikare li dijî wî bikar bîne („ez ê bavê te agahdar bikim, ko tu wêneyê tazî rênekî"). Navê vê amadekirina tawana tund û tûjiya cinsî „Grooming".

**Nimûne:**
**Keçên temenê wan çarsal î. Hemî cinayetkar hevjîn an jî hevalê dayikê bûn. Yek î bizanebûn qesta dayikê kir. Ew di rêka daxwazpelan ve li hevalekê digeriya û dît, gava keçeke wê biçuk heye. Ev hevjîn diviya cins bi zarokan re bike û „destavêtin" lezgîn ya keça wê, ji ber ew di malekê de dijîn. Dayikê tiştek li dijî serederiya tund û tûjiya wî nekir. Ew ditirsiya ko wê bicih bihêle.**

Yê cinayatkar bi rêk û pêk pilan dike û sûd ji avahiyên civakî distîne, bi taybetî nirx û pîvan. Tişta pê ve girêdayî, ew qedexeyîya axaftina li dor babetên destdirêjiya cinsî ye, ev gelek caran dibe sedem ku zarok û genc mukur neyên. Zêdebarî wê faktorekî din heye, ew perwerdehiya otorîtalîst: Zarok fêr bûne, ku li dijî gotinên mezinan dernekevin û wê bikin, ya mezin dibêjin, ew nikarin sinoran deynin û li ber xwe bidin.

Bikaranîna xerab li dijî zarokan dikare şêweyên guvaşa derûnî peyda bike:

– **Şerm:**
  Zarok bawer dikin, ew yê têkildarê tund û tûjiyê gunehkar in. Ew ji tişta ko çêbûbû jê şerm dike. Ev hest gelek caran bi hêztir bû ko hêrsê ji yê cinayetkar bike.
– **Hestê berpirsiyê yê şaş:**
  Zarok bawer dikin, ko tiştekî şaş kirine an jî ew barê berpirsiyariya ji dûrbûna malbatê ji hev hildigirin. Ev ji bo zorbeyî pirsgirêkek venabe ye.

– **Tirs ji kêşeyan:**
Zarok dibin qurbaniyê tund û tûjiya cinsî di dibistan an jî saziyên din de. Lê ew naxwazin kêşeyan di nav malbatê de, bi mamoste an hevalan re hebin.

– **Belavkirin:**
Zarok ditirsin, ku hineke din serboriyên wan bi şêweyekî din hukum bikin û hestên wan nerast derbixin.
Gelek caran ew mafê xwe nas nakin û nizanin, ku yê mezin serederiyê şaşdike û xwe dike sezabar

– **Berpirsiyarek bo serederiyeke nepen di rêka yê cinayetkar re:**
kêşeyên zarokan yên mezin, „baş" û „nebaş" û nepeniyên cuda hene. Carnan dixwazin nehêniyekê bibêjin, di gel ko yê cinayetkar guvaşê jî dike.

**Nimûne:**
**Bavekî demeke dirêj têkiliyeke xerab di gel keça xwe ya duzdehsalî re domand. Jan û azarî li ba keçê çê dike û hestek li def peyda bû, ku bavê wê karekî nedurust kiriye. Bav jê re digot ew spehîtir ji diya xwe ye û erkê wî ye weke bav, ku karê cinsî nîşanî wê bide. Ew bi gunehkariyekê li hemberî diya xwe hest dike û hest dike, ku diya wê xwe dûrî wê dike. Wê behwer jî dikir, ku ew berpirsiyarê vê yekê ye, ku bavê wê ji ber bedewî û spehîtiya wê lê xweşhatiye û çêja karê cinsî hatiyê de.**

**Keçê tu alîkarî ji hêla malbata xwe ve nedî. Lê wê bawerî bi diya hevaleke xwe ya dibistanê hebû. Wê karîbû ji wê bibêje, ka çi li malê bi serê tê. Di wê rê re, wî alîkarî wergirt, ku xwe ji wê bikaranîna xerab azad bike.**

Eger zarok ji hêla derdora xwe ve bi cidî bêne wergirtin, wê fêr bibin, ka çawa rê bo wan were daê, baweriyê bi hestên xwe bînin. Ji ber wê jî wê bi cegerdarî bikaribin, li dor serpêhatiyên xwe yê di gel mirovên pêbawer, ku têkilî bi xerab bikar anîne bipeyivin.

## TUND Û TÛJIYA CINSÎ DI RÊYA NAZDARIYÊ RE

Tund û tûjiya cinsî ne herdem „tund e" ku bi jan û êşê ve girêdayî be (bo nimûne lêxistin). Di gelek rewşan de tund û tûjiya cinsî xwe di serderiyan de diyar dike, ew yê karê nazdariyene de xwe derdibire, mîna bo nimûne, destserbirina bi nazdarî û dilînî. Ew şêwe ji tund û tûjiya li nik yê têkildar gelekî zor e, rewşeke dualî ye: Mêrê jinê an jî bav, bavpîr an hevalekî yê malbatê weha bike, ew dixwaze xweşiyekê bike, lê di vî karî de sinorên gewde û laş û her wisa yê giyanî jî derbas dike û desthilatdariya xwe nîşan dide. Mirova/ê têkildar bi xwe dibîne karekî bi azar e û girêz e. Di rêka van peyvên weha de „tu, wisa sexy yî an eger te ev cilê cinsî li ber xwe nekiraya. Diya te ne weke te hêja ye". an „Ez hest dikim, çawa laşê te bertekê dide, tu jî dixwazî …", yê cinayetkar dixwaze hestekî bide yê qurbanî, hun jî bikin.

Ew bi zarok re dipeyive, ew gunehkar e, ku ev serederiya tund û tûjiya cinsî bû. Jin jî hinek caran tûşî van tuhmetan ji berpirsiyariyê ji bo wan karan dibin.

Carnan yê qurbanî jî li dema tund û tûjiya cinsî heziya gewda ta bi lerza xweşiyê hest dike. Ev bo wan zor xerab e. Gewde tenê bo teşwîqeke cinsî nas dike. Di pey re, pêdivî ye mirov êdî şerm neke!

**Rewşa yasayî:**
Serederiyên cinsî li an bi zarokan re di bin 14 salî re herdem cizabar in.

§ 176 ji pirtûka hiqûka cizayê diyar dike: destdirêjiya cinsî jî, dema zarokek bête cebirkirin çalakiyeke cinsî di gel Cinayetkarekî/ê an hin din bike. Şêweyekî giring î din vê cinayetê, nîşandana Porongrafî bo zarokanû wisa kartêkirinê lê bike.

Hiqûka cizayê sinêlên temenê wan ta bi 18 salî ji mirovên êrîşên cinsî dikin diparêze, ji wan yên hun bi wan re di têkiliyên çavdêriyê de ne.

Ew dê û bav in (Zirbav û dê), mamoste, fêrker, karmendê civakî an karmendên din di saziyên alîkariya perwerdehiyê de. Di vî temenî de, çiqas zordarî û guvaş li ser sinêl bikar tê û girêdana yê têkildar bo berjewendiyê xwe bikar tîne.

Ciza jî bo sinêlên temenê wan ji (14 – 18-sal î) u yên kamil ji (18 – 21 sal î), dema ew di rewşeke mecbûr de keçekê/xortekî bikar bîne an jî pereyan bo çalakiyên cinsî bide.

# ENCAMÊN TUND Û TÛJIYÊ LI DIJÎ JIN Û ZAROKAN

## ENCAMÊN ŞEXSÎ

Her mirovek berteke cuda li dij tund û tûjiyê nîşan dide. Wateya cinsa taybet ya serpêhatiya tund û tûjiyê her dem û bo hemî têkildaran pinpêkirina girse ya *hebûna* xwe ye. Ev dikare bibe sedema *janeke* derûnî demdirêj.

Gelek ji yên têkildar ji jin û zarokan yên tûşî tund û tûjiya cinsî bûne, biguneh-hestkirin demeke dirêj bi wan re dimîne û cefayê ji ber dibînin,ew dixwazin, rûdanê rêkûpêk bixin, têbigehin û careke din kontrolê li ser jiyana bizivirînin. Pêkola têgehiştina rûdawê, dihêle hestê gunehkirinê peyda dibe. Mirov bi helwesta xwe bi xwe girêdanê bi kiryara tundrewiyê re durust dike.

**Nimûne:**
„Eger ez neçûba wî cihî an ez î bi reza xwe pêra binivistima, pêdiviye êdî qebûl bikim, ko ew mêrê min e û mafê wî heye, bi min re raze.“

Jinên ko bi serê wan hatî, piştî rûdanê şêweyek ji tirsê li def peyda dibe, ko êdî bi xwe û derdora xwe, carnan bi rojan nema êdî hest dike. Ew xwe di cihê xwe de biyan dibînin û ew hest peyda dibe, hemî tişta pê bawer nema heye. Ev rewş wek tevlîheviyekê dibîne.

Helwesta têkildar pey rûdanê re tekane cuda cuda ye, nimûneyek „mînak" tune. bo imkanên *şêweyê bertekan* wate girêdayî *encamên diyarbûnê* ne:

– **Gilehkirin:**
  Hinek jin piştî rûdanêdiramin herin nik polîsan.

– **Geriyana li têkiliya:**
  Hindek jin din dixwazin bi yê referens re biaxivin, li saziyên pispor bigere an di gel yek pêbawer biaxife.

– **Hilweşîn:**
  Gelek yê têkildar bi saetan digirîn, nikarin biaxifin û nîşana gumanan li wan diyar e.

– **Kontroll:**
  li hinan diyar e ko kontrol bûne, hatiye girtin, bi bîrhatiye û zelal bûye. Ji bo wê zelal e, ko tûşî tund û tûjiyê bûye û yê cinayetkar di neheqiyê de ye, û ew ji xwe dipirse, ka wê çi şaşî kiriye.

– **Lêbuhurînan dixwazin:**
  Ji bo hinekan diyar dibe, tişta ko bûye, nemerc e weke tund û tûjiyê li qelem bête danê. Ew hewl didin vê tesnîf bikin bi tund û tûjiyê, bo lêbuhurînê û wek „normal" binirxînin. Em jin dikarin zorbeyî caran ji hestên xwe yê kesayetî nebawer bin, ew fêr nebûne rê bidin, lihevketin, tirs, guman, kîn, şînî, *bêhêziyê*.

– **Aciziya ji hestê rêzlixwegirtinê:**
  Rûmet, ko serederiyeke normal di gel cins û hest bo gewdeyê xwe dikare maweyeke dûr û dirêj xerab bibe.

– **Idî, ayên li ser xwe:**
  gelek bertekiyê bi şermînî û qeleq beramber xwe an bi xwe kaniyê idî,ayê li ser xwe û hestên xwegunehbarkirinê pêşde dixe.

– **Fûrandina hestan:**
  Gelek qurbanî şaş dibin ji ber bertekiyên xwe li dema rûdanê.

Mirovên nêzîkî wan gelek caran wan pêhestkirinan bihêz dikin. Xizm, heval û nas dikarin bi bervedêriyê bertekê bidin, gelek caran bawer dikin an têdigihin , ku ev rûdan nebûye û yê qurbanî gunehkar dikin.

**Nimûne:**
**Keça çarsalî di malbateke taybet de xwedan de mezin bû, tund û tûjiya cinsî „normal" bû. Dayîkê nedixwest û nikarîbû zarokê biparêze; wê nikarîbû alîkariyê bixwaze, ji ber wê nizanîbû, ka keça wê alîkariyê dixwaze. Wê hest bi gewdê xwe winda kiribû, baweriya wê pê bixwe nema bû û hest bi dilxelênikê li ber gewdê xwedikir**

**Dawiyê wê xwe nema şuşt. Di eynî demê de hêvî dikir ko guhdan pê bibe: Ew fêr bûbû, ku vê di rêka cins ve werdigire û hevalên xwe yê dibistanê razî kir ko karê cinsî bikin. Ev serederî dihate çavdêrkirin û mîna serederiyeke cinsî dihate hesêbkirin. Ev sedemek bû, ko daxwaza kesekî pispor bikin.**

## ENCAMÊN TENDURUSTÎ

Mirov nikare encamên tendurustiyê ji serpêhatiyên cinsî gelek caran nezelal di gel tund û tûjiyê girêde. Zor pirsgirêkên derûnî û *psychosomatîk* dereng tên diyar dibe, tên zor dimînin.

Jin, yên ji biçûkanî ve pêrgî tund û tûjiyê bûne û niho wek gewde, demeke dirêj ji encama wê diêşin, gelek caran nikarin nerehetiyê encama serpêhatiya tund û tûjiyê bibînin.

Caran tête ber çavan, ko yê qurbanî birînên ji kirinên tund û tûjiyê wek encama „Buyeran" li dar dikexe.

Ev nîşanên bihên dikarin encama serederiyên tund û tûjiyê bin:

- **Ziyanên gewdane:**
  Şikestina hestuyan, xerabbûna organên hundurîn, birînên mejî mîna encama lêdana ser serî, birînên rehetnebûyî li ser hemî gewdeyî, sotandin, jihevxwarin, şopa li ser dêm, Dîtin- bihîstin, birînên zik ji encama pehîn û lêdanê an jî jiberkirina mecbûrî.
- **Birînên li cihê binzik:**
  Tecewazî birînan û xwînherikînê li qûn û quz çêdike, pelqazên iltîhaban, êşên ji encama cinsî, stewrbûn û şaşî di jidayîkbûnê de çedibe.
- **Nexweşiyên derûnî:**
  Birîna nav zikê, Tiromboz, dilêşan, serêşiya berdewam, xerabbûna gera xwînê û gelek tiştên din.
- **Zirarên giyanî wate ya derûnî:**
  Fikarên tirsê, *xerbakirina* razanê, nebawerî, xemnakî, şermînî- û hestbûna bi guneh, *Libinguhê-jihevketina dûv traumayê,* bîranînên kevin, hestên *murdariyê û hetka şerefê,* pirsa nasnameyê- û têkçûna sinoran, xwebiçûkdîtin, guman, helwesta xwe çêrkirin, êşa berdewam di dema cinsê de, helwestên cinsî bihêz, tevlîheviya xwarinê, tengasî, xermanbûna madên hişbir û dermanan, xwekuştin an jî hewldanên xwekuştinê.

Gelekcaran yên têkildar encamên giyanî bi serpêhatiya tecawizê ve girênadin. Ew nerehetiyên xwe newek encama destdirêjiyê, belê mîna „kêmasiya" xwe dibînin. Ev gelek caran digihe ecama hestê windabûna baweriya bi xwe.

## ENCAMDANÊN MALBATÎ Û CIVAKÎ

Mirov wek bûnewerên civakî girêdayî derdora xwe ne, bo nimûne ew malbat in, koma hevalan an hevalên kar in. Tund û tûjiya rasterast bêhtir li nik derdora nasan dibe – tawanbar gelekî kêm kesê biyan in-, bi wê re koma civakî têkildar e. Gelek jinên têkildar bo wan zor e, ko li ser karê tund û tûjiyê de biaxive. Tirsa wan ji nîqan e („Çima tu jî çûyî wan deveran" an „Teqez te çavên xweşik danê?"); ji hêlekê ve nayête pejirandin ko ew qurbaniyê tund û tûjiyê ne ji hêla xizm û hevalan ve, ko tund û tûjî li derûdora wan de çêbibe.

Encamên metirsîdar bo wan mirovên cinsa male/tund û tûjia cinsî:

- **Tirsa ji sinordarkirinê di nav civakê de:** Di rêya diyarîkirin serpêhatiya tund û tûjiya xwe dikare bibe sedema cudabûnê ji mêr, tenêtî, têkçûna têkiliyan di gel malbatê an tirsa ji têkiliya bi cihê hestiyar î (nû) her weha hatina tund û tûjiyê.
- **Hestbiyariya jêdûrkirina bi hêz:** Destdirêjiya demeke dirêj dibe destpêka vewejartina bi hêz ji jîngehê. Baweriya bi tenahiya xwe winda dibe. Di encamê de xwevekişandina bihêz û bi taybetî ew guhertinên di sîstema nirxdanê de.



- **Berbendkirina darayî, rê li ber çareseriyan dadidin:**
  Ev dibe encama hestiyariya jêdûrkirineke bi hêz. Di gel tirsê ji karê tund û tûjiyê serederiya yê cinayatkar hestekî mezin dide, ko êdî bêy wî jiyan nikare berdewam be.
- **Pasîfmayîn:**
  Windakirina bixwebaweriyê û bixwenirxdayînê gelek caran rê digihîne xweguncîna di gel yê cinayatkar. Li mesele mayîna saxbûnê ye. Girêdana di nav yê cinayatkar û qurbanî de weha bihêz dibe, ko yê qurbanî xwe bêhtir bi çavê cinayatkar dibîne.
- **Hestê berpirsiyaretiya beramber zarokan nîne:**
  Nekêm yê qurbanî tûşî têkçûnên derûnî dibin (Libinguhê jihevketina dûv *traumayê, sinorê têkçûnên kesayetiyê, têkçûn û jihevketina nasnameyê),* mîna encama piştguhxistina zarokên xwe.
- **Metirsiya ji guherînê:**
  Pêşniyarên jiyanê û rewşa kar dikarin di dema jihevcudanê bêne guhertin: Bo nimûne qewirandina ji kar an guherîna cihê kar, pirsgirêkên li cihê kar, bêkarî.
- **Xizanî:**
  Ji ber cudabunê ne hindik jin xizan dibin an jî metirsiya mezin berbi xizaniyê ve. Bi wê ve girêdayî, jidestçûna xanî û bêxanîbûn. Jin û zarok, pey serpêhatiyên tund û tûjiyê tora xwe ya civakî winda dikin, meitirsiyeke mezin ji xezaniyê heye.

Yên têkildar netenê ji barê *bitenêhiştina* civakî dinalin. Gelek jin direvin xaniyên bo jinan û netenê derdora xwe ya pêbawer terk dikin, belê semyanên xwe jî li dûv xwe dihêlin. Gelek caran di *gilihkirinê,* meseref an qerebokirina zirarê dibuhurin.

Sedemên bo vê ev in:

- Tirsa ji êrîşên tund û tûjiyê careke din
- Şermînî, ji ber zorbeyî caran, xwe bi xwe (di gel) gunehkar dibîne û naxwaze rûmeta malbatê bişikîne;
- Dizanin, rêya *dadê* zor e û ne hercar serketî ye;
- Serpêhatiyên di bineretiya civaka petryarîkî de: Mafê mêran heye, jin û zarokanê xwexwedan bike û dikre karê cinsî jinê bixwaze.

## ENCAMÊN NIFŞÊN QUNAXCUDA

Mirovên, di zarokatiya xwe de tûşî tund û tûjiyê bûne, di dahatûyê de bi xwe dibin cinayatkar an jî di „rola qurbanî“ de dimîne.

**Nimûne:**
**Dayika keçika çarsalî, bi xwe di çarsaliya xwe de tûşî tund û tûjiyê bûbû. Wê wek dê nikarîbû xwe û keça xwe biparêze. Zêdebarî wê, ew fêr bûbû bikeve têkiliyê cinsî di gel mêran. Keça wê jî di temê dozdehsalî de ew kar bixwe girt. Alîkara malbate pirs dikir, çima dê nikarîbû keça xwe ji êrîşên hevjînê xwe biparêze. Bersiva dayîkê ev bû: bo min normal bû-ev bi xwe bi serê min jî hatiye.“**

## ENCAMÊN SER ZAROKAN

Zarokên, rasterast an na tûşî tund û tûjiya malbatê bibin, ew jî wek yên têkildar bixwe *tûşî zirarên* derûnî bûne û di peyî re bi traumayeke giran dikevin.

Encama xuayniyê ev in:

– **Daktina hestê xwenirxbûnê:**
  Xwe naskirin gelekî tête bisinorkirin.

– **Dilşikestin:**
  Tecrûbeya qelsî û bêhêziya parçeyekî ji dêbav dikare bêhêziyê pitir bike.

– **Nirixandina nerast:**
  Tecrûbeya qelsî û bêhêziya dêbav dikare bibe sedema, ko zarok xwe li hêla yê cinayatkar bibînin, ji ber li wir hestê tenahiya xwe bêhtir bibînin.

– **Nemûneya necihgirtî ya Pêşwêneyî:**
  Zarokên tecrûbeya tund û tûjiya malbatî dîtî, zorê caran dibin cinayatkar an jî qurban.

– **Zirarên gewdeyî:**
  Di hemî pergalên ko zarok li tengêla ziyanê derûnî, mîna dayîka xwe, birînên gewdane jî hene. Carcaran dixwazin alîkariya dayîkê bikin. Di pey wê re ew bi xwe jî rasterast dibin qurbanên serederiyên tund û tûjiyê.

– **Barê hilgirê nepeniyan:**
  Zor caran, pêdiviye zarok ji ber erkê çûna dibistanê hene, têkiliyên xwe yên derve bi cedi bigrin. li dema tund û tûjiya nav malbatê de gelekî dikevin bin guvaşa. Ew ditirsiyan, ko bavê wan bikeve zindanê, ji ber wan nikarîbû devê xwe bigrin. Ji wan re tê gotin, hun gunehkar in, eger polîs bavêje ser mala we û malbat ji hev bikeve. Bi mana li malê tête tehdîdkirin. Ev sedem e ko di gelek rewşan de zarok naxwazeserpêhatiyên xwe li malê biaxife. Li derveyî wê mamoste, li gelek dibistanan nikarin baş di gelt und û tûjiyê serederiyê bikin.

– **Xemnakiyên giran:**
  Hemî veşartin û derbiderkirina yên tecrûbe derbaskirine, dikarin bibin sedema bisinorkirinên civakî, lê dikarin bigihin sinorê xwekuştinê.

– **Handerê guhertinan:**
  Gelek zarok malbata xwe berdidin û dixwazin destpêkeke nû çebikin.

> **!** **Here nik mirovên tu bi wan bawer. Bi wan re biaxife û bi saziyên şêwirmendiya pisporî li dor alîkarî û parastinê bo zarokan, yên tûşî tund û tûjiya malbatê.**



# 4. Rêkên ji tund û tujiyê diçin

## MAFÊ PARASTINÊ BO QURBANIYÊN TUND Û TÛJIYÊ LI ELMANIYA

**Zarok, Jin û mêr li Elmaniya yeksan in. Derfetên parastinê bo hemî kesan weke hev e.** Qurbaniyê tund û tûjiyê li Elmaniya derfetên ciyawaz hene. Mafê her yekî heye, jiyaneke wî bêy tund û tûjiyê hebe.

Gelek dêmên tund û tûjiya ya ji hevjî derdikeve hene: Riswakirin, sinordariya azadiya kesayetî, kontrol, êrîşkirin, gefxwarin, Lêdan, cinsê bizorê, zulim an jî neheqî

## ALÎKARÎ Û REWŞA AWARTE

Eger hevjiîn bilezgînî tund û tûjî kir, dikare bo **polîs** di bin nemra **110** telefon bike kirinê an jî li qereqola polîsa bête pirsîn. Polîs mecbûr e bilez were, ji bo mirovan biparêze. Polîs dikare tanî 14 rojan yê cinayatkar ji mala hevbaş dûr bixe. Polîs dikare bo demekê bo zindanî bike, ji bo cihbicihkirina dûrxistina wî ji malê. Eger serederiye cizabar be pêdivî ye polîs gilî tomar bike.

Jinên tûşî tund û tûjiyê bûne dikarin berê xwe bidin malên jinan û li wir bi zarokan re bo demekê bicih bibin. Giring e birîn ji hêla doxtor ve bête feheskirin û bibelgekirin.

**Hemî mirov li ber hiqûkê ewkhev in. Jin û zarok mafê wan yeksan e mina mêran û destûr heye bi xwe biryarê werbigirin. Hiqûk û ol ji hev cuda ne.**

## DERFETÊN ŞÊWIRMENDIYÊ

Jinên tûşî tund û tûjiyê bûne alîkarî, piştgiriyê û şêwirê werdigirin bo derfetên parastinê ji saziyên şêwirmendiyê, malên jinan, nivîsgehên alîkariya qurbaniyan an hawarhatina tund û tûjîyê (Li adrêsên têkiliyan binêre). Saziyên şêwirmendiyê yên pispor agahiyên bêhtir didin, bêyî gilihek jî bête kirin. *Gilihkirin* dikare dereng jî bibe. li ser daxwazan, şêwirmendî dikare nepenî be.

Jinên tûşî tund û tûjiyê bûne dikarin ji hevalên xwe. xizim an jî cînarên xwe daxwaza piştgirtinê bikin.

Eger gilihkirinek pilankirî be, di vî halî divêt şêwirmendekî hiqûkî bo şêwirê bête xwestin.

**Karmendê saziyên şêwirmendiyê yên pispor, doxtor û *parêzer* dikevin bin barê erkê nemukurhatinê. Li dema *metirsiyê imkana zarok* bikevin bin barê metirsiyê, hinga êdî erkdar in nivîsgeha gencan agahdar bikin.**

### RÊMAYÊN PARASTINÊ PEY HIQÛKA PARSTINA JI TUND Û TÛJIYÊ

„Mirovê lêdanê bike, diçe" – Ev hiqûk bo parastina her yekî tûşî tund û tûjiyê, belaxwelêxistin û yarîkirin bûbe.

Kî bibe qurbaniyê tund û tûjiyê, gefxwarinê an jî lihevanînê, dikare serbixwe ji *pêvajoya cizayê* **ji bo parastina dadgeha sivîl** bixwaze. Li vir yê têkildar dikare bêpere ji saziya şêwirmendiya bot und û tûjiyê piştgiriyê werbigire, Tevdîrên dadgehê pey qanûna parastina tund û tûjiyê (GSG) bi pera ye. Yê pêdivî be, hatin û mewdanê wî nebe, dikare *buhayê pêvajoyê alîkariyê* bistîne.

Her kesek dikare daxwaznamê bo fermana parastinê li nik dadgeha malbatê (Mehkema îdarî) li cihê lê, li cihê buyer lê qewimî bû an cihê manê pêşkêş bikin.

Wek tevdîrên parastinê dadgeh dikare bo nimûne yê cinayatkar qedexe bike,

– xwenêzîkkirina malê,
– biçe wan deveran, yên ew jinên tûşî tund û tûjiyê bûn bi berdewamî diçin wir (pêdiviye),
– têkiliyan deyne
– an jî ya têkildar bibîne.

Kî bi yê cinayatkar re di malekê de bijî, dikare daxwazê bo veguhestina xênî bike.

Tevdîrên parastinê ji hêla dadgehê ve, di demeke destnîşankirî de bête danînû xebera polîsan pê bê xistin. Eger yê cinayatkar li dijî fermana parastinê ya dadgehê binpêkir, ew xwe dike cizabar. Êdî dikare telefon bo polîsan bête kirinê.

### TEVLÎBÛNA PARÊZER

Nûnertî di rêya parêzer re nemerc e. Kî bixwaze gilihekî bike, pêdiviye eseh mirovekî qanûnî bo xwe bîne, êdî hingî derfet heye, ko kartêkirinê li pêvajoyê bike. Yên têkildar êdî wek dawekirî tên. Di saziyeke şêwirmendiya bot und û tûjiyê an saziyeke piştgiriyê, dikarin hin parêzerên xwedan serpêhatî pêşniyar bikin.

Yê nikaribe şêwirmendekî parêzer bo xwe bikar bîne, derfet heye, *şêwira alîkariyê* bo şêwirmendiya yekem daxwaz bike. Bona ji bo alîkariya şêwirmendiyê li dadgeha îdarî cihê rûniştinê heye. Li dema pêşkêşiya daxwaznamê yên têkildar dikarin piştgiriyê ji saziyên şêwirmendiya tund û tûjiyê werbigirin.

Kî bibe qurbaniyê karekî cizabar û wek şahid di pêvajoyeke cizayê pêdivî be lê bête guhdarkirin, ew jî dikare daxwaza bonê bo şêwira yekem bike.

Derveyî wê jinên tûşî tund û tûjiyê bûne dikar wek dozker amade bibe û parêzerekê wek nûnera dozkerê piştgir be. Mesref dikare di bin mercên destnîşankirî de bixwe bêne girtin. Mesrefa nûnera dozkerê dikare li nik şêwirmendiya yekem ya parêzeriyê an li ba saziyeke şêwirmendiyê ya tund û tûjiyê bête pirsiyarkirin.

Di dema lêpirsînê mîna şahidekî, tête pêşniyarkirin ko parêzerekî mîna *şahidek alîkar* bîne. Di bin mercên destnîşankirî de dikare mesref jî bête danê.

**DERFETÊN PIŞTGIRIYÊ DIN**

Alîkarî ne tenê li nik saziyên şêwirmendiyê hene, parêzer an malên jinan. Ji bo lêpirsînê *mirovekî pêbawer* dikare di gelb e, lê divêt daxwaznameyek bête pêşkêşkirin.

Jinên têkildar dikarin jî hêsanîkerên derûnî civakî yê pêvajoyê bibin. Hêsanîkerên derûnî civakî taybet hatine fêrkirin û piştgiriya şahidên qurbaniyan û xizmên wan beriya, di dema û di pey pêvajoya cizayê dikin. Hevalrêtiyên derûnî civakî rojane karmendên pispor ji saziyên şêwirmendiyê yên pispor werdigirin, dako cudahiyeke zelal di nav pêvajoyê û piştgiriya rojane misoger bimîne û mirov nikaribe hevalrêtiya pêvajoyê kartêkirinê, li dadgehê lê bike.

**! Ji qanûna diwem, sala 2017an de, maf heye ko hevalrêtiya pêvajoya derûnî civakî heye.**

## ÇI DI PEY GILIHKIRINÊ RE ÇÊ DIBE?

Ji bo gilihkirina cinayetê ji ber tund û tûjiya nav malê an ya cinsî, gotina yên têkildar xwedan wateyeke mezin e, ji ber yên din zorbe çi belge nînin radiwestin an rola temamker digêrin. Di gelek rewşên kêm de wek şahidên rasterast in, ko dikarin bêjin.

Kî bixwazê giliyê xwe bike, pêdivî ye li ber çavên xwe deyne, ko wê zorcaran (b.n. li nik polîsan **û** li dadgehê) bi dirêjahî çawa çêbûye bibêje, ev barekî giran e dikare diyar bibe. Ji bo xwe bo wê amade bikin, giring e, li demên zû li saziyên şêwirmendiyê bigere. Jinên tûşî tund û tûjiyê bûne, wek alîkarî dixwazin ko psîkososyal hevalrêtî seranserî prosesî bike.

Hinek ji yê têkildar neamade ne, li ser yê tund û tûjî kiriye çu daxuyaniyê bidin, bizanebûn bi derew derdixin an jî ji qalbêw wê kêm dikin. guman heye, ko yên tikildar vî tiştî dikin ji ber ji tund û tujiyên bêhtir ditirsin an ji ber çu derfetê nabînin, ko têkiliya xwe ji yê cinayatkar bibirin. Eger kesek gilih neke, ew dibe sedem ko tiştek nebe. Alîkarî û şêwir bo van pirsan û hinek din, navendên pispor yê şêwirmendiyê hene, bê ko gilih jî bête kirin.



### PARASTIN BO TÊKILDARAN

Dema gilih bibe polîs bi yê cinayatkar re gelek caran, jê re tê gotin guftûgoya metirsiyê dike: Yê tawanbar ji hêla polîs ve tête agahdar, ko dest ji têkiliyê bi ya qurbanî re û tund û tûjiyê berde. Ev gelek cinayatkaran ditirsîne, ko pêgirî bi wan gotinan bikin. Giring e, yên têkildar ji polîsan re bêjin, eger careke din danûstendin çê bibe an hewldana kartêkirinê (di rêka kesekî siyem re, bo nimûne xizim an hevalên cinayatkar) bikin. Tenê wilo polîs dikare serederiyê bike!

### TÊKILIYÊ BI POLÎSAN RE

Polîsên jin di navendên polîsan in û taybet bo karê di gel qurbaniyên ji encama tund û tûjiyê hatine fêrkirin. Parêzera jin an nûnereke din dikare bo lêpirsînê amade bibe. Eger zehmetiyên ziman hebin, divêt bo polîs hatibe gotin, bo anîna wergervanekî pispor.

Danûstendina di gel karmendên lêpirsînê mîna polîs, bo wê ye, ko pêdiviye ew çalak bibin.

Ew jina têkildar biryarê werdigire di dema birêveçûna gilih dijî axaftinê bêje, tenê derfet heye, dema mafê nemukurhatinê wek şahid hebe, ji ber jin xwe an jî yek ji xizmên xwe bi axaftineke wisa de bargiran dike.

**!** **Gilih nikare bête vekêşan.**

### PÊVAJOYA DIN

Heger mesele hate tuhmetbarkirin an jî prosesa dadgehê, bo têkildaran careke din dibe giraniyeke taybet. Amadekirineke baş di gel alîkariya saziya pispor ya şêwirmendiyê, rêhevaltiyeke civakî derûnî bo prosesê an yeke parêzer dikare tirsê bide alî.

Rêya bilindkirina gilihekî, ne hêsan e. Lewra gelekî baş dibe, baş li dor çawaniya birêveçûna pêvajoyê û mafê xwe di pêjoyê de û dibe tevdîrên parstina yê cinayatkar û rêhevaltiya prosesê ji destpêkê ve agahdar be.

## SAXLEMIYA DERMANKIRINÊ-, XANENEŞÎN- Û ALÎKARIYÊN CIVAKÎ

Heger mirovek bikaribe bawerî bidest bixe, ko ew ji yekî bi mebest rastî êrîşeke li dijî hiqûkê kir û di encamê de ziyanên tendurustî peyda bûn, mafê wî heye ji ber encamên tendurustî û aborî ji dewletê alîkariyê werbigire. Yê ko sê salên wî bi şêweyekî yasayî li Elmaniya çênebûbe, bo wî li gor hatina wî jê re derdikevin.

Alîkariyên bihên dikarin di rêka *qanûna qerebokirina qurbaniyan* (OEG) de ne:

- Saxlem- û dermankirin *(Terapiya derûnî* jî)
- *xizmetên xaneneşîniyê* (girêdayî bi encamên ziyanên û dibe bi hatinê ve jî be)
- *Xizmetên xweşiyê,* dema pêdivîbûnê di rêya alîkariyê taybet di rewşeke tekane de (bo nimûne beşdarbûna di karê jiyanê de, lênêrîn. birêvebirina mesrefa malê û temamkirin bo hesabê jiyanê)
- *Tevdîrên rehabîlisiyonê* (bo nimûne mana saxlemgehê)

## PÊKVE AZD JI TUND Û TÛJIYÊ

Niho li saziyên pispor bi şêwirmendiyê kar li ser piştgiriya *xwebixweparastin* bo jiyaneke azad ji tund û tûjiyê bo jinê tête kirin. Guftûgo li ser asteyeke bilind in û amanc jê bihêzkirina bixwebiryardanê û bilindikirina hestê naskirina nirxên xwe bixwe li nik yên têkildar. Ew fêr dibin, ka delîve û rûmet dikarin li kû bin.

Ew jî fêr dibin, ko û çawa dikarin çalak bibin û bikarbin liber xwe bidin û ko jinek tûşî tund û tûjiyê bûbe çi karînên wê hene, ko xwe ji tund û tûjiyê azad bike. Tişta girêdayî wê jî, li tenişta bihêzkirina jinê (beriya her tiştî maf û derfetên wê, xe bi xwe pêk bîne) hêza mêran jî, ko ji xwe bawer in, çawa ew jî di kewdanên zor de dikarin serederiyê bikin, bêyî ko tund û tûjiyê bikar bînin.

**! Yê tund û tûjî jiya be, nayê wê wateyê ko wê hemî jiyanê qurbanî bimîne – Rê hene ji tund û tûjiyê derkevin.**

# Ferhenga têgehan

| | |
|---|---|
| **Alîkariya qanûnî** | Alîkariya darayî bo yên hatin/sermiyanê wan têra wan nake (nebes be) dako karê dadgehê bi rê ve bibin |
| **Alîkariya şêwirmendiyê** | Ev alîkariyeke fermî ye, ko derfeteke bo wan mirovên hatina wan kêm e, şêwirmediyeke yasayî û nûnerekî bo xwe bibînin. alîkariya şêwirmendiyê alîkariyek e bo cidîgirtina mafan derveyî pêvajoya dadgehê |
| **Bazirganiya jinan** | Sefera jinekê bi sedema hin sozên nerast, xapandin an fêlûfût, ko ew qerz an jî hijmarek bilind ji pereyan bo simsariya an xizmetekê bide, eger tund û tûjî, guvaştin an jî gefxwarin li dij wê bikar bihêt an jî bizorê karekî bike û kedxwariyê bikin |
| **Bêdesthilatî** | Desthilatiya derûnî-an bêxwedîtî di rewşekê de |
| **Bertekên bersivandinê** | Serderiyên rewşên cuda |
| **Bikaranîna desthilatê** | Serdestkirin/kontrolkirin/bo xwe biakaranîn an mirovekî |
| **Bikaranîna xerab** | Bikaranîna zêde ya mirovekî bo xwe. serederiya cinsî li wî an zarok/gencan an li mirovên, ko nikaribin li ber xwe bidin (pêdiviyên alîkariyê, zindanî tbd.) |
| **Bineretiyên patriyarkî** | durvê civakekê ye, ko mêr yê herî bêhtir desthilat û maf ji yê jinê heye |
| **Binpêkirina sînoran** | Her serederiyek, amanca wê dilxweşkirina pêdiviyên xwe ye û bêy liberçavgirtina daxwaz an gewde, derûn,zanebûn an kêmasiyên zimên yên din bigire |
| **Dadwerî** | Tevaya karmendan, yên berpirsên cihbicihkirina yasaya ne |
| **Danûstendin** | Dana hev/pevguherandina agahiyan |
| **Derbeder û lêgerên penaberiyê** | Penaber ew mirov in, yê li ser xaka Elmaniya li parstina ji her lidûvçûneke siyasî, qewirandin an jî her rengek ji vegerandinê bo her welatekî, ko tê de lidûvçûna wan hebe an jî metirsî li ser jiyana wan hebe digere. |
| **Derketinên encam/zirarên encam** | Encam wate zirar ji kewdanan. Bo nimûne gazinên derûnî, yên bi sedemên tund û tûjiyê çêdibin |
| **Derûn** | Têkildarî giyan e |
| **Derûnnasiya gewde/ Psîkosomatîk** | Nexweşiyên gewde, yê hemî an parçeyek jê vedigere sedemê derûnî |
| **Destûrdayîn** | Di gel vê destûrdayînê rawestandina vegerandinê tê dayîn (ev ne mafê mayîneke mafnasî ye). |

| | |
|---|---|
| **Dûv trauma û têkçûnên libinguhêhevketinê** | Nexweşiyeke derûnî pey serpêhatiyek destnîşankirî an metirsî li ser jiyanê peyda dibe (Traumata) |
| **Erkê cihê manê** | Çapa li Elmaniya bo derbederan/penaberan, tenê li cihê bo wan hatiye destnîşankirin dikarin bimînin |
| **Gilî/Gilihkirin** | Gihandina xebera karekî ciza li ser heyî li nika polîsan an gozger. Ev gilihkirineke dikare ji hêla her kesî ve bête kirin |
| **Hevpişkê cinsî** | Hevpişk, yê pêre têkiliyên cinsî hene |
| **Hiqûk** | Qanûnên bo pirseke destnîşankirî ne |
| **Jiberkirin** | Derbederkirina bi zorê ya gelekî an parçeyek ji gelekî bo welatekî din |
| **Kedxwarî** | Pêwendiyên nedurust an nelirê di nav mirovan an koman de. Di nav wan de kedxwarî li ser pêwîstî an qelsiya rewşa mexdûr tê fêmkirin |
| **Kesê pêbawer** | Ew, yê baweriyeke mezin pê heye |
| **Malên parastina jinan/ saziyên jinan** | Ew sazî û mal in, yên taybet parstinê û piştgiriyê bo jinan pêşkêş dikin |
| **Metirsî** | Kewdanên, ko dibêt, tê de nexweş bikevin, bilind dibin bo nimûne nexweşiyeke derûnî bi sedema serpêhatiyên tund û tûjiyê |
| **Metirsiya li ser xweşiya zarokan** | Rewş ya ko zarok xwe baş nabîne û xweşiya wî di bin metirsiyê de ye. Bo nimûne, dema tund û tûjî li mal lê bibe |
| **Nehênîkirin** | Erkê yasayî yên grûpên pîşeyî ciyawaz, ko zaniyariya li ser wan bo kesê siyem neyête danê |
| **Pakijkirina etnîkî** | Gelek caran grûpek ji hevwelatiyan ji warê wan/welat bi tund û tûjiyê têne derxistin (olî) |
| **Pakîtî** | Lihevhatina nirxên (Kesayetî) di gel jîngehê |
| **Parêzera jin** | Nûnerek û şêwirmedeke serbixwe ye di rewşên yasayî de. Parêzer bi yasaya nemukurhatinê ve pabend in û ji ber wê jî erk e li ser wan nehêniyan eşkere nekin. Ev yeka baweriyê di navbera parêzer û miwekîlê diparêze |
| **Pasîfmayîn** | Nebeşdarî, bêkarî, bêvîn |
| **Pêvajoya ciza** | Lidûvçûna yasayî ya kiryarek sûc ser heyî |
| **Pişkên sezayê** | Kiryarên li dijî yasayên heyî |
| **Qanûna parastina ji tund û tûjiyê (GSG)** | Rêkxistina qanûnan ji tevdîrên parastin yên yasayên sivîl bo qurbaniyan ji tund û tûjiyê |
| **Qanûna qerebokirina qurbaniyan (OEG)** | Qanûna rêmayên qerebokirinan û têrkirina qurbaniyên kiryarên tund û tûjiyê û bo yên li pey wan mayî |

| | |
|---|---|
| **Qehpîtiya bizorê** | Ticareta mirovan bo amanca kedxweriya cinsî |
| **Rebenkirin** | Ew serderiya mebest jê nexweşkirin an bêrûmetkirinê di rêka kesekî din re bibe |
| **Rêjeya pêvebendbûnê** | Têkilî, li nik yekî bi mirovekî din ve girêdayî be ye (bo nimûne darayî an hest) |
| **Rewşa hiqûkî** | Qanûnên bo babteke destnîşankirî ne |
| **Şahidê alîkar** | Piştgirê(a) yasayî/alîkarî bo şahidan |
| **Saziyên fêrbûnê** | Ew saziyên, li ser bingeha welat an herêmî hatine danîn û erkê fêrkirinê bi wan tête dan. Li vir dibistan û bexçeyê zarokan, lê saziyên din jî mîna pirtûkxane, mozexane an komeleyên bi gêl |
| **Saziyên şêwirmendiya pisporî** | Saziyên şêwirmendiya pisporî ew in yên xwe di gelek beşan de xwe pispor kirin û bi giştî agahî, şêwirmendî, ligelçûn, danasîna derfetên danûstendinê û têkilî bi kesên di beşên xwe de jêhatî ne pêşkêş dikin |
| **Serdestî** | Têkiliya mirovekî bi yekî din re, ko yek ji wan rola sereke heye û serdestê yê din e |
| **Stendina azadiyê** | girtin (dergehlêgirtin, revandin tbd.) li dijî vînên mirov! |
| **Têkçûn û pirlêhatina kesayetiyê** | Ev têkçûneke kûr e di kesayetiyê de di rêya buyerên traumayê re. li vir du kesayetî an jî bêhtir di hundurê mirov de peyda dibin |
| **Têkçûna kesayetî ya xeta sinordayî** | Têkçûna kesayetî, di rêya nesazkarî li pêwendiyên nav mirovan, rewş û wêneyê xwe de tête liberçavhatin e |
| **Têkiliyên binçavkirinê** | Têkilî, yê mirovek ji yekî din xem lê tê xwarin û piştgiriya wî dike (bo nimûne zarok ji hêla mamoste ve têne piştgirîkirin) |
| **Tenêkirin** | Tenêtî/Bêparhiştina kesekî |
| **Terapiya derûnî** | Terapî bo dermankirina têkçûnên derûnî an encamên derûnî |
| **Tevdîrên hevguncînê** | Dubare vegerandina nexweşên gewde/derûnî bo nav civakê |
| **Traumabûn** | Serpêhatiyek, ko mirovek nikaribe hilîne û ji ber wê demek dirêj bi nexweşiyên derûnî bikeve |
| **Tund û tûjiya derûnî** | Şêweyek ji yê tund û tûjiyê, li nika wan mirovê ko rasterast gef, riswakirinên derûnî an serederiyek tirsandin/kontrolkirin dibe, tûşî ziyanên hestane dibin |
| **Tund û tûjiya ser bingeha zayendê** | Tund û tûjî li dijî mirov li ser bingeha zayenda wan |
| **Welatê mazûlvan** | Ew welat e, yê mirovên derbeder an jî penaber werdigire/li kok es koçê xwe deyne |

| | |
|---|---|
| **Xala reş li ser şerefê** | Pêvajo, li nika mirov an jî komên yên nirxên neyênî ji hinek tiştên destnîşankirî hene û ew bi şêweyekî wî tiştî dixin çarçoveyeke destnîşankirî |
| **Xemnakî** | Nexweşiyeke derûnî ye, sîmayê kêmbûna hêzê, xemgînî, windakirina balkêşanê, dest-likar negeriyayî li nika wî çêdibe |
| **Xizmeta xaneneşîne** | Mafê wan bo hinek pere bo statuya civakî/temen |
| **Xizmeta xweşkirinê** | Alikariyê fermî ji pêdivîdaran di çarçoveya presîpên xweşkirinê. Li vir, perê xanî, perên bêkariyê an jî alîkariya civakî hesab dibin |
| **Xweparastin** | Berî metirsiyê dikarin xwe bi xwe biparêzin |
| **Xweşbînî = „lêbuhurker"** | Mirovekî dibhure |
| **Xweşiya zarokan** | Rewş, ya ko zarok xwe tê de baş dibîne |
| **Yeksanayî/Wekhev** | Misogerkirina mafên wekhev û berjewndî. wekhevkirina yasayî û serederiyeke wekhev bêy liberçavgirtina zayendî, temen, cihê jêhatî, ol tbd |
| **Zorlêkirin** | Mecbûrkirina mirovekî, bo kirina tiştekî |

# Adrêsên têkiyê yên bijarte

| | |
|---|---|
| **Anti-Diskriminierungsstelle des Bundes**<br>Glinkastraße 24<br>10117 Berlin<br>Tel.: 030 185551865<br>Demên axaftinê: Duş – În<br>09:00 – 12:00 û 13:00 – 15:00<br>E-Mail: beratung@ads.bund.de<br>www.antidiskriminierungsstelle.de | **Navenda Anti-cudakariyê ya federal**<br>Şêwirdarî li dor mafan di rewşa cudakariyan, belavkirina pisporên herêmî de. |
| **Bff – Bundesverband Frauenberatungs-stellen und Frauennotrufe Frauen gegen Gewalt e.V.**<br>Petersburger Straße 94<br>10247 Berlin<br>Tel.: 030 32299500<br>Demên axaftinê: Duş – Pêncş 10:00 – 17:00, În ji10:00 – 14:00<br>E-Mail: info@bv-bff.de<br>Fax: 030 32299501<br>www.frauen-gegen-gewalt.de | **Bff – Komeleya Federal ya navendên şêwirdariyê û bangên lezgîn yên jinan li dijî tundrewiyê (e.V. = Li dadgehê tomarkirî)**<br>Saziyên seranserî Elmaniya federal, ew yên bo jinên tûşî tundrewiyê bûne kar dikin.Banka agahiyan bi navendên herêmî yên Şêwirdariyê, û bangên lezgîn yên jinan û stargehên jinanan di bin vê navnîşanê de: www.frauen-gegen-gewalt.de/organisationen.html. Agahî bi erebî, engilîzî û Turkî jî. |
| **Bundesarbeitsgemeinschaft der Kinderschutz-Zentren e.V.**<br>Bonner Straße 145<br>50968 Köln<br>Tel.: 0221 569753<br>E-Mail: die@kinderschutz-zentren.org<br>Fax: 0221 5697550<br>www.kinderschutz-zentren.org | **Civaka hevbeş ya federal bo navendên- parastina zarokan e.V.**<br>Şêwirdarî ji bo zarok û malbatên tûşî pirsgirêkên tundrewiyê bûne alîkariya pêşîlêgirtinê tête pêşniyarkirin, dibe zarokên têkildar bi lezgînî têkevin nexweşxanê.<br>Banka agahiyan yên navendên herêmî bo parastina zarokan di bin: www.kinderschutz-zentren.org/zentren-vor-ort |
| **Bundesarbeitsgemeinschaft Täterarbeit Häusliche Gewalt (BAG TäHG e.V.)**<br>Hohenzollernring 106<br>13585 Berlin<br>Têkilî: Danelia Krüger<br>Tel.: 0162 1398443<br>E-Mail: danelia.krueger@bag-taeterarbeit.de | **Civaka hevbaş ya federal bo karên Cinayetkarên tundrewiya nav malê (BAG TäHG e.V.)**<br>Saziyên hevbeş yên Interkulturel bo dezgehên karên cinayetkarên tundrewiya nav malê li Elmaniya, karê parastina qurbaniyan dike û karê parastina ji tundrewiyê jî. |

**Deutsche Gesellschaft für Prävention und Intervention bei Kindesmisshandlung und -vernachlässigung e. V.**
Sternstraße 9 – 11
40479 Düsseldorf
Tel.: 0211 4976800
E-Mail: info@dgfpi.de
Fax: 0211 49768020
www.dgfpi.de

**Civaka elmanî bo pêşîlêgirtin û destwerdanê li dema serederiyeke xerab bi zarokan re û – piştguhxistinê e. V.**
Komela pisporan (taqekes û peymangeh) ji seranserî Elmaniya û welatên cîran, yên armancên wan yên hevbeş hebin, çalak ji bo başkirina parastina zarokan kar bikin

---

**Deutsches Institut für Menschenrechte**
Zimmerstraße 26/27
10969 Berlin
Tel.: 030 259359-0
E-Mail:
info@institut-fuer-menschenrechte.de
Fax: 030 259359-59
www.institut-fuer-menschenrechte.de

**Peymangeha elmanî bo mafê mirovan**
Ev peymangeh agahdariyên karê fermî li dor mafê mirovan li hundur- û derveyî welêt belav dike bo pêşîlêgirtina birîndarkirina mafê mirovan û her weha bihêzkirin û parstina mafê mirovan.

---

**Frauenhauskoordinierung e. V.**
Tucholskystraße 11
10117 Berlin
Tel.: 030 33843420
E-Mail: info@frauenhauskoordinierung.de
Fax: 030 338434219
www.frauenhauskoordinierung.de

**Koordînasiyona stargeha jinan e. V.**
Saziyên seranserî Elmaniya federal, ew yên bo jinên tûşî tundrewiyê bûne kar dikin.Banka agahiyan bi navendên herêmî yên Şêwirdariyê, di bin vê navnîşanê de:
www.frauenhauskoordinierung.de/beratungsstellen-suche.html
Banka agahdariyan di gel stargehên jinan di bin:
www.frauenhauskoordinierung.de/frauenhaussuche.html
Danîna ziman û hinek taybetmendiyên din yên derfetên alîkariyê, ber çav.

---

**Hilfetelefon Gewalt gegen Frauen**
Tel.: 08000 116016
Demên axaftinê: Duş – Şemô, 24-demjimêr
www.hilfetelefon.de

**Telefona alîkariyê tundrewî li dijî Jinan**
Şêwirdariya bi telefonê ya bêpere û nepenî. Û bi zimanan jî: Albanî, erebî, bulgarî, çînî, darî/faisî, engilîzî, ferensî, îtalî, kurdî (kurmancî), polonî, portugalî, rumanî, serbî, spanî, rûsî, turkî, vitnamî.
E-Mail-şêwirdarî, civan- Chat
24 demjimêr- xizmeta-bi hawarî

| | |
|---|---|
| **Hilfetelefon Sexueller Missbrauch**<br>Tel.: 0800 2255530 | **Telefona alîkariyê bo yên serederiyên xerab yên cinsî di gel wan bûne**<br>Bêpere & nepenî, şêwirmendiya telefonê bo yên serederiya cinsî digel hatine kirin. Rêberek li dor dezgehên alîkarîyê li herêmê, û ji penaberan re jî. |
| **Jugendportal zwangsheirat.de**<br>Brunnenstraße 128<br>13335 Berlin<br>Tel.: 030 4050469930 (bêpere)<br>demên axaftinê: Duş15:00 – 18:00,<br>Sêş + Pêncş 10:00 – 13:00<br>E-Mail: info@frauenrechte.de<br>Fax: 030 40504699-99<br>www.zwangsheirat.de | **Portala ciwanan zewicîna bi kotekî. Jugendportal zwangsheirat.de**<br>Telefona pirsgirêkan dijî zewaca bi kotekî. Şêwirdariya-Online, blogekê û karekî lêgeryanê bo navendên Şêwirmendiyê li seranserî Elmaniya, pêŞkêŞ dike |
| **KOK – Bundesweiter Koordinierungskreis gegen Menschenhandel e. V.**<br>Kurfürstenstraße 33<br>10785 Berlin<br>Tel.: 030 263 911 76<br>Fax: 030 263 911 86<br>E-Mail:info@kok-buero.de<br>www.kok-gegen-menschenhandel.de | **KOK – koordînasiyona federal ya li dijî bazirganiya bi mirovan**<br>Ev sazî çalak e, li ser astên herêmî, dewletî û navdewletî ji bo cenga li dijî ticareta bi mirovan û kedxweriyê her weha bo cihbicihkirina mafên têkildaran û xebatê li ser bicihanîna mafê mirovan yê penaberan dikin. |
| **Krankenhäuser** | **Nexweşxane**<br>Li ferhenga herêmî di lênivîsa telefûnan de. dikare jî saziyên derbederan, dikare li nik saziyên penaberan jî be, dextor, kasa nexweşiyan, kasa nexweşan û kesên pêwendîdar bête pirsîn. |
| **Notfall-Nummern**<br>112 (Xizmeta qurtalkirinê/Agirkuj)<br>110 (Polîs) | **Numereyên-hawariyê**<br>Dema alîkariyatendurustî, di demên teng de, bêpere, (xizmeta qurtalkirinê), agir (agirtemirander), metirsiya li ser kesan (Polîs) |

**Notruf und Beratung für vergewaltigte Frauen und Mädchen e.V.**
Kasseler Straße 1a
60486 Frankfurt am Main
Tel.: 069 709494
E-Mail: info@frauennotruf-frankfurt.de
Fax: 069 79302795
www.soforthilfe-nach-vergewaltigung.de

**Telefona hawarhatinê û şêwirdarî bo jin û keçên tûşî tecawiziyê bûne e.V.**
Her agahiyên giring yên alîkariya tendurustî piştî tecawiziyê bi nepenî û bawerpêkirî dide.

---

**Nummer gegen Kummer**
**Telefon-Beratung bei Sorgen und Nöten**
Telefona zarok- û gencan:
Tel: 116111
Demên axaftinê: Duş – Şemî 14:00 – 20:00
Telefona dê û bavan:
Tel.: 0800 1110550
Demên axaftinê: Duş – În 09:00 – 11:00 û
Sêş + Pêncş 17:00 – 19:00

**Nemreyên li dijî jihişketinê**
**Telefon-Şêwirdarî dema tirs û pêdiviyan**
Bêpere & nepenî ji telefona destan û ya malê. Seranserî Elmaniya alîkarî di rêya şêwirdariyê de bo zarokan, gencan û dê û bavan di rewşên aloz de û eger metirsî li ser xweşiya jiyana zarokan hebe

---

**TERRE DES FEMMES**
**Menschenrechte für die Frau e.V.**
Brunnenstraße 128
13355 Berlin
Tel.: 030 4050469930
Demên axaftinê: Duş 15:00 – 18:00,
Sêş + Pencş 10:00 – 13:00
E-Mail: info@frauenrechte.de;
beratung@frauenrechte.de
Fax: 030 40504699-99
www.frauenrechte.de

**TERRE DES FEMMES**
**Komela Mafê mirovan bo jinan e.V.**
Rêxistina qezenca mafê mirovan ji bo şêwirdayîna jinan agahdariyên kesayetî, telefon an jî Online dike.
Şêwirdayîn bi elmanî û turkî

**Unabhängige Patientenberatung Deutschland**
Tel. erebî: 0800 33221225
Sêşembê 11:00 – 13:00
Pêncşembê: 17:00 – 19:00
Tel. Elmanî: 0800 0117722
Duş – În: 08:00 – 22:00
Şemî: 08:00 – 18:00
Tel. Rûsî: 0800 011 77 24
Duş – Şemî: 08:00 – 18:00
Tel. Turkî: 0800 0117723
Duş – Şemî: 08:00 – 18:00
Online-Patientenberatung unter
https://online.patientenberatung.de/

**Şêwirdariya serbixwe ya nexwşan li Elmaniya**
Agahdarî li ser lênêrîna tenduristiyê li Almanya (bêyî sîgorteya tendurustiyê!), şêwirdariya bêpere ya telefonê ji bo telefona destan û ya erdê. Şêwirdarî li Ereb, Almanya, Rûsyayê û Tirkî dibe.

---

**Weisser Ring**
Telefona-qurbaniyan: 116 006
www.weisser-ring.de

**Xeleka Spî**
Bêpere & nepenî, şêwirdariya telefonî, hawarî-/pirsgirêkên destwerdanê, navberî, alîkariya yasayî, alîkariya mirovahî

---

**Zentrale Informationsstelle Autonomer Frauenhäuser**
Markt 4
53111 Bonn
Tel.: 0288 68469504/-05
Demên axaftinê: Duş + În 09:00 – 13:00,
Çarşemb 14:00 – 17:00
E-Mail: zif-frauen@gmx.de
Fax: 0228 68469506
www.autonome-frauenhaeuser-zif.de/de/autonome-frauenhaeuser/adressliste

**Sentrala navenda agahiyên stargehên jinan yê autonom**
Banka agahiyan di gel stargehên jinan yên herêmî

# Têbînî

# Parastin û ewlekarî ji tund û tûjiyê bo jin û cîwanên derbeder li Elmaniya

Naveroka vê rehberê agahiyên li dor mijara „Parastin û ewlekariya li hember tund û tûjiyê“ ji bo jinên derbederbûyî, penaber û cîwanan li Elmaniya vedihewîne.
Bi vê rehberê em, dixwazin we agahdar bikin li dor mafên we û derfetên parastinê li Elmaniya. Em, agahiyan di gel van babetên bihê pêşkêşî we dikin:

- Tund û tûjiya berî, niho û pey derbederiyê re
- Sedem, şêwe û encamên tund û tûjiyê
- Kî tund û tûjiyê dike?
- Rêyên ji tund û tûjiyê diçin
- Adrêsên alîkariyê yê têne pêşkêşkirin ji bo têkildar û xizman

Ev rehber di çarçova projeyî „MiMi- parastina ji tund û tûjiyê di gel penaberan ji bo penaberan“ li seranserî Elmaniya hatiye bi pêş de tête birin.
Hun dikarin vê berhevokê ji malperên „www.mimi-gegen-gewalt.de“ û „mimi-bestellportal.de“ bixwazin.

Bi alîkariya:

Ev Rehber hate pêşkêş kirin, di rêya: